Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :983 | 31-Tîrmeh- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com 423165

# Afirîndeyeke balkêş yê deryayê

**Serê Tîrmehê di Behra Pasîfîkê de zanyaran dîmenekî "qelema deryayê" girt.**



Ev "qelema deryayê" afirêdekî mezin ê dûvik li paş bû. Zanyar meraq dikin gelo ev ne cûreyekî nû ye.

Zanyaran ev afirîdê hanê di keştiya lêkolînê E/V Nautilus de dît. Weqfeke xêrê ya bi navê Ocean Exploration Trust wê ji bio lêkolîna bi kar tîne.

Yekî ji van zanyaran got, "Ez ecêbmayî bûm." Dîmen ji aliyê driona binê deryayê ve hatibûn girtin. Ev drona binê avê ji keştiyê ve tê birêvebirin. Axir hema li cem afirîdê deryayê yê dîmenê wê hatî girtin yeke din jî hebû, lê dîmenên wê nehatine girtin.

Dûvikên vî mexlûqê hanê qederê 40 santîmetroyan dirêj in û bi qurmekî qederê 2 metroyan dirêj ve ne. Ev mexlûqê behrê bi temamî nêzî 3 metroyan dirêj e. Ew li rojavayê Hawaiyê hat dîtin.

Beriya "çend mehan zanyarên Spanî 2 cûreyên "qelemên behrê" qeyd kirin. Ê duyem cûreyekî nû bû. Dîtina cûreyên nû bi rastî jî tiştekî kêmdîtî ye.

***Ozgûr Polîtîka***

# Çima hişbir belav dibe!

**Berdevkê Asayişa Germiyanê Osman Ebdulkerîm ragihand ku di nava 6 mehan de ji ber bikaranîna madeyên hişber, 65 kes destgîr kirine.**



Osman Ebdulkerîm derbarê kesên di nezaretê de ji ber bikaranîn û bazirganiya madeyên hişber ên li herêma Germiyan a ser bi Silêmaniyê de, daxuyaniyek da çapemeniyê.

Osman Ebdulkerîm destpêkê got, di nava 6 mehên pêşî yên sala 2022'yan de hêzên wan li Germiyanê 65 kes ji ber bikaranîn û bazirganiya bi madeyên hişber kiriye nezaretê

Di beşeke din a axaftina xwe de Osman Ebdulkerîm dibêje; "Ji wan kesên di nezaretê de 24 xelkê herêmên Iraq û Herêma Kurdistanê ne, kesên din jî biyanî ne."

Osman Ebdulkerîm neda zanîn ka ew biyarî kî ne? Kurd in yan xelkekî din in. Wî her wiha li ser desema belavbûna bikaranîn madeyên hişbir û narkotîkê li navçeyê jî agahî nedan.

***ROJNEWS/GERMIYAN***

# Bi 3D hunerên xwe nîşan dan

**Xwendekarên Beşa Mekatronîkê ya Zanîngeha Rojava di dawiya salê de projeyên xwe nîşan dan.**

Xwendekarên Beşa Mekatronîkê ya Zanîngeha Rojava di dawiya salê de projeyên xwe nîşan dan. Di nava projeyan de tankeke ji dûr ve tê kontrolkirin a ji bo vemirandina agir a bi sensorên ji sorê wêde û pompeyeke avê, pîrebokên robotî, droneyek, milekî protez ê ku bi lepikên bi sensor tê kontrolkirin û gelek tiştên din jî hebûn.

Ev proje hemû bi parçeyên ku 3D hatine çapkirin hatine çêkirin. Beşa Mekatronîkê




beşeke înterdsîplîner e ku mekanîk, elektronîk û sîstemên kompûterê digihîne hev.

***ANF***

# Berhemên şêwekar û wênekêşên ji Rojava li Rûsya tên nîşandan

**Berhemên şêwekar û wênekêşên ji Rojava li Galeriya Tretîkovska ya li Moskova tên nîşandan.**

Li ser navê Nûnertiya Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê li Federasyona Rûsyayê, hunermendên Kurd beşdarî pêşangeha Navneteweyî ya li Galeriya Tretikovskayê tê lidarxistin, dibin.




Ev pêşangeh bi piştgiriya Şaredariya Moskova, Yekitiya Hunermendên Rûsyayê û Yekitiya Evrasya ya Hunerî pêk tê. Pêşangeh ji 31'ê Tîrmehê heta 7'ê Tebaxê wê vekirî be. Di meha Gulanê de 2 fotografkêşêm Kurd Alan Roj û Rodî Tahlo bi fotografên xwe di pêşbazîya fotografan a li Petersburgê dereceya 2. û 3. girtibûn.

Xebatên şêwekar û hunermendan yên ji Bakur û Rojhilatê Sûriyê li gelek saziyên çandî û fermî yên Rûsyayê hatin nîşandan. Ev xebat hem roleke girîng ji bo balkişandin û danasîna herêmê û rewşa wê dilîze hem jî derfetek e ji bo hunermedan da ku xebat û dengê xwe bigihînin derveyî welat.

***ANHA***

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Ardû | Tiştên ku agir bi wan pê dikeve; weke êzing, dar û tiştên wisa. |
| Deklarasyon (Fransî) | Ragihandin, daxuyanî, danezan: Bi deklarasyonekê serxwebûna xwe ragihand. |
| Defakto (Latînî) | Tişta ku dibe û pêk tê lê ne fermî: Başûrê Kurdistanê defakto dewlet e. |
| Heman | 1. Tiştên, yan kesên weke hev, eynî: Em heman tiştî dixwin. 2. Du karên di yek zemanî de: A, di heman demê de du karan bi hev re dike. |
| Meteor (Fransî) | Kevirên ji ezmanan dikevin dinyayê. |
| Nostaljî (Fransî) | Hestê bîrîkirina tiştên bedew yên berê. |
| Pêşeng | Rêber, serok, mezin, rêzan: A, pêşengekî pir baş e. |
| Pêşengî | Rêberî, serokî, mezinayî, rêzanî: A, pêşengiyeke pir baş dike. |
| Pêşniyaz | Pêşniyar, pêşkêşkirin, teklîf. Ji bo ku bê pejirandin, pêşkêşkêşkirina daxwaziyekê: Al, pêşniyaz kir ku riya kolanê bê çêkirin. |
| Reaksiyon (Fransî) | Bertek, nerazîbûn, li hemberî tişteki diyarkirina helwestê: Li hemberî axaftina wî reaksiyon nîşan da. |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | H | Ê | J | A | ■ | L | I | ■ | L |
| 2 | O | ■ | A | R | G | O | ■ | A | A |
| 3 | ■ | T | R | ■ | Ê | ■ | Ê | L | ■ |
| 4 | R | A | ■ | A | J | O | ■ | A | G |
| 5 | E | ■ | S | S | ■ | F | A | L | ■ |
| 6 | Ş | E | P | A | L | ■ | V | ■ | H |
| 7 | ■ | J | Î | ■ | A | B | ■ | J | I |
| 8 | Î | N | ■ | Ê | V | A | R | ■ | Z |
| 9 | D | Û | V | ■ | A | ■ | E | M | R |

## Xaçepirs

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | ■ | | | | | ■ |
| 2 | ■ | | | | | ■ | | ■ | |
| 3 | | | ■ | | | | ■ | | ■ |
| 4 | | ■ | | ■ | | | | | |
| 5 | | | | | ■ | | | | ■ |
| 6 | | ■ | | | | | ■ | | |
| 7 | ■ | | | ■ | | ■ | | | ■ |
| 8 | | | ■ | | | | | | |
| 9 | | | | | ■ | | | ■ | |

### ÇEP-RAST

1. (Rustemê ...) Destaneke me... Ew nîjada spî ya ku tê bawerkirin ji kurê Hz. Nûh Sam peyde bûne; wekî kesê ku bi erebî, îbranî, asûrî û hebeşî diaxivin
2. Roja piştî îro
3. Kurteya ajansa fermî ya Tirkiyeyê... Genimê hêrandî
4. Mehek
5. Vê carê... Sarincên avê yên di binê erdê de
6. Alava ku pê rîs tê ristin... Hejmarên du, çar, şeş, heyşt û hwd.
7. Baneşana ku pê ga tê ajotin û sekinandin... Pirç
8. Peyveke teşwîqkirinê... Melevanî, soberî
9. Tiştê ku pê debar tê kirin... Cejn, eyd

### JOR-JÊR

1. Cihê herî kûr ê okyanûsan û devera ku tîrêjên rojê nagihîjinê... Bi rûsî erê
2. Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku wekî sembola hêzê bi kar tînin... Lib
3. Xanedana qraliyeta Vîetnamê... Çiyayekî me
4. Tevgera hewayê... Notayek... Agir
5. Bajarekî me... Xwarina ku êvariyan tê xwarin
6. Di dereke robarê de di saniyeyê de hecma herikîna avê... Daçekek ku wateyê xurt dike
7. Notayek... Jin an jî mêrê ku hevsera/ê wî/wê miriye... Di dîrokê de dewleteke kurdan
8. Alavê ku tişt pê tên dawerivandin
9. Rojek

# `Bi ruhê berxwedana gerîlayên azadiyê li hemberî tecrîdê tê bikoşin`

Têkildarî tecrîda li ser Rêber Abdullah Ocalan, Xaliya Necar diyar kir ku, armanca tecrîdê, têkbirina projeya demokratîk û qutkirina gel ji fikir û felsefeya Rêber Apo ye. ***R-2***



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 983 | 31-Tîrmeh- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# XETERA HERÎ MEZIN DEWLETA TIRKÎ YE

Ewedelah bal kişand ser desteka Tirkiyê ya komên çete û wiha axivî: " Ji bo belavkirina krîzê li Rojhilata Navî Tirkiye ji aliyê dewletên Rojavayî ve hatiye erkdarkirin. Eger li herêmên Rojhilata Navî ewleyî û aramî pêk werin, wê ev dewlet nikaribin dewlemendiya Rojhilata Navî kontrol bikin. Libya û Iraq mînakên berbiçav in. Her kes dizane ku dewleta tirkî terorîstan ji bo armancên dagîrkeriyê bi kar tîne û ji bo van planan NATO destekê didiyê." ***R-4***



## Ha li Iraqê daye, ha li Sûriyê ferq nake!

**Idrîs Henan**

Li gorî ajansa istixbarata Rûsî, Erdogan, Barzanî şandiye Bexdayê ku hinek helwestan nerm bike û amade ye ku tawîzan bide. Lê tenê bila Iraq meselê mezin neke.***R-5***



## 'Êrişên dagîrkeriya tirkî yên ser welatên Ereban xetera herî mezin e'

Mihsin Ewedelah diyar kir ku dagîrkeriya tirkî li ser tevayiya welatên Ereb xeter e û got, yekîtiya gelê Kurd û Ereb ji hêzên dagîrker re mirin e. ***R-4***

## 'Fermana Êzîdiyan ya 2014'an îro jî bi destê dewleta tirkî dubare dibe'




Hediya Şemo: Tevî êş û azarên hatîn kişandin, gelê Şingalê bi xwe re hêza jinûavakirina Şingalê dît û li hemberî dagîrkeran serî dananî. ***R-5***

## Koordînasyona Jinan astangiya nas nake û ber bi armanca xwe ve tê dikoşe

Rûken Mela diyar kir ku yek ji armancên herî girîng yên Koordînasyona jinan, aktîvkirina rola jinan li tevayiya qadan e. ***R-2***

## Welatiyên Qamişlo: Kiryarên Tirkiyê û çeteyên wê bandorê li hêz û berxwedana me nakin

***R-6***



# `Bi ruhê berxwedana gerîlayên azadiyê li hemberî tecrîdê tê bikoşin`

**Têkildarî tecrîda li ser Rêber Abdullah Ocalan, Xaliya Necar diyar kir ku, armanca tecrîdê, têkbirina projeya demokratîk û qutkirina gel ji fikir û felsefeya Rêber Apo ye.**

**Dilîn Ehmed-Qamişlo**

Derheqê tecrîda li ser Rêber Apo û armanca wê ku di şexsê Rêber Apo de li ser gelê Kurd û gelê azadixwaz tê meşandin, endama Kongreya Star ya bajarê Qamişlo Xaliya Necar ji rojnameya me re axivî.

**`Bêdengiya li hemberî tecrîdê erêkirina qirkirina gelê Kurd e`**

Xaliya Necar got, ji ber ku projeya Rêber Ocalan projeyeke demokratîk e, hêzên serdest, li hemberî zilim û zora tê kirin, bêdeng in. Lewra ev hêz li dijî jiyana wekhev in.
Xaliya axaftina xwe wiha domand: "Bêdengiya dadgehên navneteweyî û rêxistinên mafê mirova, tê wateya hevkariya bi tecrîdê re. Qaşo ev sazî û rêxistin xwedîexalq in ji bo mafdayînê ne, lê mixabin li hemberî tecrîda li ser Rêberê gelên bindest her kes xwe kor û lal dike. Banga me ji dadgehên navneteweyî û kesên demokrat ew e ku, helwesta xwe diyar bikin li dijî vê zilmê bêdeng nemînin."
Li ser berxwedan û têkoşîna gelê Kurd û gelê azadîxwaz, Xaliya bang li gelan kir ku dengê azadiyê bilint bikin û got, li dijî tecrîda li ser Rêber Apo, divê gelê me bi ruhê gerîlayên azadiyê yên ku ji bo parastina mafê me û jiyaneke birûmet, li dijî dagîrkeran şer dikin û canê xwe feda dikin, li her çar aliyên Kurdistanê rabe ser piyan û tê bikoşe.

**'Divê jin xewn û xeyalên xwe yên li ser xaka xwe ya azad bi Rêber Apo re pêk bînin'**

Xaliya wiha domand: "Bi qasî berxwedana gelan, divê jin ji bo azadiya Rêber Ocalan, bixebitin. Lewra yê ku jin ji bindestiyê rizgar kirîn, yê hêz dayî jinan, yê jin ji di cîhanê de ji zilma zilam parastîn Rêber Abdullah Ocalan ne.
Xaliaya Necar wiha dirêjî da axaftina xwe: "Yê hêz dayî me jinan û hişt ku dewletên bi hişmendiya zilamê desthilatdar û zayenperest jî hesabê hêze me bikin Rêber Apo ye. Divê em jî bi hêza dayî me, Rêbertiya xwe azad bikin. Rêbertiya me cewherê jinê derxsit holê. Divê em xewn û xeyalên xwe yên jiyaneke azad û wekhev li ser xaka xwe bi Rêber Apo re pêk bînin. Lewra mafê me ye. Banga me ji bo jinên cîhanê, jinên azadîxwaz, li hemberî tecrîdê bêdeng nemîn. Divê em bi deng û xebata xwe bibin xelekek ji agir li dijî tecrîdê. Lewra Rêbertiyê me hêjeye ku em canê xwe fedayî wî bikin."

**`Em û Rêber Apo ti carî ji hev qut nabin`**

Endama Kongreya Star ya bajarê Qamişlo Xaliya Necar axaftina xwe wiha qedand: "Di dawiyê de banga me ji bo dewletan heye ku li dijî tecrîdê çavên xwe vekin û xwe lal nekin. Lewra ev zilim û zora li ser gelê me bi tecrîda li ser Rêber Apo ve ji sedş sed



girêdayî ye û em vê êdî ji ti kesî re qebûl nakin. Weke dibêjin kêr gihiştiye hestî. Ev tecrîd ne li ser Rêbertiyê tenê ye, herwiha li ser gelên azadîxwaz tevan tê meşandin. Lewra Rêbertî û gel ji hev qut nabin. Ruh û doza wan yek e."

# Koordînasyona Jinan astangiya nas nake û ber bi armanca xwve tê dikoşe

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

**Rûken Mela diyar kir ku yek ji armancên herî girîng yên Koordînasyona jinan, aktîvkirina rola jinan li tevayiya qadan e.**

Koordînasyona Jinan bi avakirina Rêveberiyên Xweser re li herêmê, sala 2014`an hat avakirin. Xebata xwe ya perwerdekirin û piştgiriya jinan, çareserkirina pirsgirêk û astengiyên li pêşiya wan derdikevin pêş xist. Li herêma Tebqa, Reqa, Minbic û Dêrazorê jî piştî ku hatin rizgarkirin dest bi kar kir. Lê karê wê ne parçeyekî fermî û bingehî yê Saziyên Rêveberiya Xweser bû.

5`ê Sibata 2021`ê li ser pêşniyara Komisyona Jinan ya bakur û rojhilatê Sûriyê di civîneke fermî ya Meclîsa Giştî de, Tevlîbûna Koordînasyona Jinan ji bo Rêveberiya Xweser hat erêkirin.
Piştî sazkirin û fermiyeta Koordînasyona Jinan, bû sîwanek ji bo tevayiya jinên di nava saziyên li bakur û rojhilatê Sûriyê, kar dikin. Armanca wê ew e ku rola jinan di tevayiya qadan de, bi taybetî di xebata siyasî û qada biryardayînê de çalaktir bike. Koordînasyon li ser bingehê tevayiya saziyên Rêveberiyên Xweser û sivîl yên li bakur û rojhilatê Sûriyê û di binê sîwana Koordînasyona jinan ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê de kar dike. Mekanîzmaya karê wê ew e ku mehane li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê civînan li dar bixe.
Ji bilî wê jî şopandina sepandina sîstema navxweyî di koordînasyonên di nava rêveberiyê de, nîqaşkirina rewşa jinan bi giştî li bakur û rojhilatê Sûriyê û nirxandina xebata wê ya şeş mehan yan jî salekê di civînên wê de tên kirin.
Têkildarî armancên Koordînasyona jinan û mekanîzmaya çalakiya wê, Cîgira Rêvberiya Desteya Jinê ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê Rûken Mela Îbrahîm, ku di rêveberiya Koordînasyonê de jî cih digire ji me re axivî.

**Armancên koordînasyonê û mekanîzmaya çalakiyên wê**

Rûken Mela Îbrahîm bal kişand ser armanca kar û xebatên koordînasyonê û wiha got: "Yek ji armancên herî girîng yên



Koordînasyona jinan, aktîvkirina rola jinan di tevayiya qadan de ye. Bi taybetî di xebatên siyasî û biryardayînê de, xurtkirina prensîba hevserokatiyê di tevayiya saziyên Rêveberiyên Xweser de ye. Herwisa piştgiriya projeyên aborî yên jinan û birêxistinkirina tevayiya jinên ku di saziyên Rêveberiya Xweser de li bakur û rojhilatê Sûriyê kar dikin. Armanceke me ya sereke jî pêşxistin, parstin û perwerdekirina jinan e, da ku di tevayiya saziyan de pêşeng bin."

Têkildarî xebatên Koorînasyonê yên aborî jî Rûken Mela ev nirxandin kir" :Desteya Koordînasyona Jinan butçeya piştgiriya projeyên jinan di Rêveberiya Xweser de diyar dike û nabe ku kêmî ji sedî 10 ji butçeya giştî ya rêveberiyê kêmtir be."


**Astengiyên kar**

Herwisa têkildarî astengiyên herî diyar yên li pêşiya xebatên Koodînasyonê derdikevin Rûken Mela diyar kir ku yek ji pirsgirêkên sereke ku karê wan asteng dike û dereng dixe, rewşa Sûriyê û êrişên ser bakur û rojhilatê Sûriyê ne. Herwiha da zanîn ku şer û krîza aborî, rewşa ne aram, koçberbûna xelkê ku bandoreke neyênî li ser rola jinan ya di civakê de dike.

**`Emê xwe bigihînin tevayiya jinan û piştgiriya wan bikin`**

Cîgira Rêveberiya Desteya Jinan ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê Rûken Mela Îbrahîm axaftina xwe wiha qedand: "Em wek Koordînasyona Jinan soz didin ku xwe bigihînin tevayiya jinên bakur û rojhilatê Sûriyê û bi her awayî piştgiriyê wan bikin. Bi hêviya ku ewleyî û aramî li Sûriyê bi giştî misoger bibe û herêmên me yên dagîrkirî rizgar bibin. Ji bo koçber vegerin warên xwe û jin bi aramî di nava civakê de û li ser xaka xwe bijîn, emê têkoşîn û karê xwe xurttir bikin.

**Planên koordînasyonê ji bo 2022`yan**



Koordînasyonê sala 2022'yan gelek plan peşkeş kirin, bi taybetî vekirina baxçeyên zarokan li tevayiya herêman, vekirina kursên perwerdeyê yên girtî ji bo tevayiya kadroyên jin yên di Rêveberiyên Xweser û sivîl de, têkoşîna li dijî diyardeya parsekkirina zarokan û belavkirina amarên şeş mehan yên tundiya li ser jinan, amadekirina dosyayên binpêkirinên li dijî jinan li herêmên dagîrkirî û şandina wan ji bo rêxistinên pêwendîdar û mafên mirovan, piştgiriya projeyên aborî yên taybet li kampan, vekirina navendên parastina jinan li Minbic û Reqa, piştgirî û girîngîdayîn karkirina malbatên şehîdan û ciwanan, sazkirina çalakiyan ji bo tîmên jinan yên werzişê. Jixwe beşek ji van planan pêk hatiye û yên mayîn jî wê di mehên pêş de biqedin.



# 'Kilamên wî bi me re ne'

**Bi ser mirina Dengbêj Fadilê Cizîrî re 4 sal derbas bûn. Ew herî zêde bi payîzoka "Heyran Jaro" di bîra xelkê de ma.**

Birayê Dengbêj Cizîrî, Dengbêj Seyît Mehmet Ergûl behsa birayê xwe kir û wiha got: "Di ser mirina wî re 4 sal derbas bûn lê klamên wî di her kêliya jiyana me de ne."

Cizîrî ku wê demê li gund dîwan bi dîwan, dawet bi dawet digere, bi gelek zehmetiyan re rû bi rû dimîne. Di sala 1992'yan de li Şaredariya Cizîrê dest bi karê zabitetiyê dike. Lê piştre dev ji kar ber dide û dîsa li dengbêjiyê vedigere. Kurê wî yê 13 salî Cemal Ergul ku pirr jê hez dikir, di qezayeke trafîkê de jiyana xwe ji dest dide û ev êş bandoreke wisa li Cizîrê dike ku nexweşiya Parkînsonê lê peyda dibe û nema dikare êdî bistre. Her wiha kurê wî Mûrat Ergul jî di qedexeyên derketina kolanan ên Cizîrê de tê qetil kirin. Birayê Cizîrî, Dengbêj Seyît Mehmet Ergul (56) bi minasebeta salvegera wefata birayê xwe behsa dengbêj Fadilê Cizîrî kir.

**'Mamosteyê me diya me bû'**

Dengbêj Seyît Mehmet Ergulanî anî ziman ku birayê wî Cizîrî tu caran dev ji dengbêjiyê berneda û wiha behsa wî kir: "Em bi eslê xwe ji Dihokê ne. Piştre em derbasî gundê Salatûniyê yê Silopiyayê bûn.

Em ji wir jî derbasî Cizîrê bûn. Ev demekê dirêje em li vir dijîn. Me di temenekî piçûk de dest bi dengbêjiyê kir. Wê demê civat hebûn. Em bi hevre diçûn û me di civatan de klamên berê di-



gotin. Mamosteya me diya me bû. Heke ew nebûya, me nedizaniya klaman bibêjin.

Fadil demek piştre fêrî gotina her klamekî bû. Payîzok, lawka û giranî digotin. Ji dengbêjiyê gelek hez dikir. Payizokên wî pirr xweş bûn. Kesekî bi qasî wî payîzok xweş nedigotin. Di malbata me de rêûresma dengbêjiyê bi salane dewam dike. Di malbata me de gelek dengbêj derketin. Di berê de dema ku jinan dengbêjî dikir digotin,'şerm e.' Ji ber wê jî dayika min bi veşartî klam ji me re digotin û bi vî awayî em fêrî gotina klaman dikir".

'Kilamên wî her bi me re ne'
Bi domdarî Ergul bi lêv kir ku ew ê vê kevneşopiya ji diya xwe fêr bûne bidomîne û ev tişt anî ziman: "Fadil ji min mezintir bû. Piştre di şaredariyê de weke zabite xebitî. Çend salan di şaredariyê de xebitî û piştî ku ji kar derket dengbêjî dewam kir. Gelek kilam jî min û wî bi hevre gotine. Fadil 63 salî bû. Piştre jî nexweşiya parkînsonê lê peyda bû. Bi mehan di nexweşxaneyê de tedawî dît. Dema ku wefat kirî jî bi min re bû. Min ew dibir nexweşxaneyê û di rê de jiyana xwe ji dest da. Ji



herdu zarokên xwe pirr hez dikir. Ji xwe piştî wan nexweş ket û êdî nema karî rabe. Êdî nekarî kilaman bibêje. Bi ser wefata wî re ev 4 sal derbas bûn lê klamên wî di her keliya jiyana me de ne.

Ez jî weke birayê wî, vê çandê didomînim. Bi qasî ji destê me tê jî ez ê dewam bikim."
***Ozgûr Polîtîka***

# Mizgîn Tahir: Mûzîk ji bo min jiyaneke azad e

**Hunermenda operayê Mizgîn Tahir bang li jinan kir û got "Her tim fikir û xeyalên xwe bi cih bînin, bixwînin û pêl bi pêl rabin; ji ber ku di Şoreşa Rojava de tovê jina azad hatiye çandin."**

Jinên ku bi hunera xwe mohra xwe li Şoreşa 19'ê Tîrmehê dane, xwe di her beşê jiyanê de pêş xistin û bûn xwedî îrade. Yek ji wan jinan jî Mizgîn Tahir e ku bi dengê xwe yê operayî destan û çîrokên Kurdî kirin stran û çîrokên gelê xwe nemir kir. Mizgîn Tahir diyar dike hêviya wê ev e ku stranên Kurdî yên operayî û destan û çîrokên Kurdî navneteweyî bibin.
Mizgîn hestên xwe yên ji bo pîrozbahiya Şoreşa 19'ê Tîrmehê, her wiha derbarê çawanî û naveroka hunera ku pêşkêş dike û têkiliya di navbera jin û muzîkê de ji ANF'ê re axivî.

**Stiraneke taybet ji bo zarokên Kobanê**

Hunermenda operayê Mizgîn Tahir axaftina xwe bi vegotina hesreta xwe ya ji bo hatina Kobanê û pîrozkirina 19'ê Tîrmehê ya li wir des tpê kir û got; "Min dixwest ku ez 19'ê Tîrmehê li Kobanê pîroz bikim, her wiha azadiya Kobanê û tevahî Rojava li Kobanê pîroz bikim. Me û koma xwe mamosteyên Orkestraya Zarokan me berê xwe da Kobanê û me li wir şahî li dar xist, me gelek stran kirin yek û ji wana yên 'Kobanê', 'Serêkaniyê', 'Rûbarê Min' bûn. Her wiha me straneke taybet diyarî zarokên Kobanê kir ku ew jî bi navê 'Mirîşka Kobanê' ye. Ji ber ku hest û hezkirina zarokên Kobanê ketin dilê min, ez dixwazim tiştekî taybet li ser zarokên Kobanê çêbikim."

**'Mûzîk jiyaneke azad e'**

Mizgîn Tahir destnîşan kir ku muzîk ji bo wê jiyaneke azad e û wiha pêde çû; "Dema ku ez distrêm tenê ez di nava kûrahiya wê stranê û wan gotinan de me, ji ber wê yekê yê ku bi min re di wê stranê de ne, tenê wan dibînim."

**'Hewl didim destanên kurdî bibin opera'**

Mizgîn Tahir her wiha got ku hêviya wê ev e ku destanên Kurdî bi şêwazê operayê bistrê û bike berhemên navneteweyî û wiha axaftina xwe domand; "Min li Şamê ya ku paytexta Sûriyeyê ye beşa konservaûtara operaya klasîk xwend. Ez di malbateke hunerî de mezin bûme, bavê min dengbêj e, bira û xwîşka min jî dengbêj in. Min her tim destan û çîrokên Kurdî ji wan dibihîst, ji ber wê min dixwest biçim akademiyê. Li ser vê yekê min beşa opera li Şamê xwend. A niha dixwazim tiştekî enternasyonalî ya bi Kurdî çêbikim. Di nava van projeyan de hewl didim ku destanên Kurdî bibin opera."

**Xeyala dîtina kobanê**

Hunermend Mizgîn Tahir bi bîr xist ku dîtina Kobanê bi taybet di 19'ê Tîrmehê de ji bo wê weke xeyalekê bû û got; "Ez ji Rojava me, lê min hîna Kobanê nedîtibû, beriya şoreşê tenê weke rêwî ez tê re derbas bûm. Ji bo min xewn bû ku ez Kobanê bi taybetî di 19'ê Tîrmehê de bibînim. 19'ê Tîrmehê ji bo min rojeke



pir bi qedir û qîmet û pir bi wate ye. Min dixwest ku di 19'ê Tîrmehê li Kobanê di nava wê germahiyê de bim ku şehîdan ji me re hiştine, rê ji me vekirine û welat rizgar kirine."

**'Her tim li pey xeyalên xwe bin'**

Hunermenda operayê ya dengxweş Mizgîn di beşa dawî ya axaftinên xwe de ev peyame da ciwan û jinên ciwan; "Her tim li pey xeyalên xwe bin û timî berê xwe bidin armancên xwe." Mizgîn Tahir her wiha diyar kir ku divê kêrhatiyên xwe bi zanistî bikin, ger ku hevalên we yên muzîsyen hebib berê xwe bidin wan û tiştekî baş bidin avakirin."

**'Di şoreşa rojava de tovê jina azad hatiye çandin'**

Hunermend Mizgîn Tahir bi vê banga xwe ya taybet bang li jinan kir û got "Ez taybet ji bo jinan dibêjim ku her tim pêşiya xwe vekin, her tim fikr û xeyalên xwe bi ser bixînin, bixwînin, pêl bi pêl rabin; ji ber ku di Şoreşa Rojava de tovê jina azad hatiye çandin."
*ANF*

# Welatiyên Qamişlo: Kiryarên Tirkiyê û çeteyên wê bandorê li hêz û berxwedana me nakin

Welatiyên bajarê Qamişlo hê jî dîmenên komkujiya çeteyên DAIŞ'ê ya 27'ê Tîrmeha 2016'an li taxa Xerbî ya bajarê Qamişlo kirîn, ji bîr nekirîne û dibêjin, domandina kiryarên hovane yên dagîrkeriya tirkî tola şkestina DAIŞ'ê ji gelê berxwedêr e.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Piştî rizgarkirina bajarê Minbicê ji aliyê Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) ve û binketina DAIŞ`ê li gelek herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, 27`ê Tîrmeha 2016`an saet li derdora 09:20`an çeteyên DAIŞ`ê bi kemyoneke bombebarkirî taxa Xerbî ya bajarê Qamişlo kir hedef û komkujiyeke mezin kir. Di encamê de di gel 3 endamên Hêzên Asayîşê 60 welatî şehîd bûn û 175 kes jî birîndar bûn. Çeteyan dixwest bi wê teqînê Rêveberiya Xweser û vîna gelê berxwedêr bişkînin, lê gelê bakur û rojhilatê Sûriyê bi hêz û vîna xwe destkeftiyên xwe mezintir kirin.

Tevî 6 sal di ser komkujiyê re derbas bûne, ji aliyê dewleta tirkî ya dagirker ve li herêmê komkujî dewam dikin. Li gorî tevgera dewleta tirkî, ya berî şoreşê û heta niha tê xuyakirin ku hebûn û êrişên çeteyên DAIŞ`ê bi hevkariya wê hatine kirin. Herwiha tişta ku wê demê bi riya wan çeteyan dikir, niha bixwe dike. Bê navber bi balafiran êrişî sivîl, siyasetmedar û kesayetên neteweyî û leşkerî yên bakur û rojhilatê Sûriyê dike. Rojane êrişî bajar û gundewarê herêmê dike û her kesê welatparêz û ji aliyê gel ve tê heskirin dike amanc. Herî dawî êrişî sê pêşengên jin yên Yekîneyên Parastina Jinê (YPJ) kir û 4 endamên rêveberiya Hêzên Ewlekariya Hundir yên Eyn Îsa şehîd bûn.

Bi pêmana salvegera şeşan ya êrişa DAIŞ`ê ya li taxa Xerbî ya bajarê Qamişlo, kesên di kêliya teqînê de amade bûn, li ser komkujiyê û domandina komkujiyan ji aliyê dewleta tirkî ya dagîrker ve ji me re axivîn.



**`Rojeke reş bû û ti caran nayê jibîrkirin`**



Walatiyê bi navê Ehmed Mihemed ku ofîsa wî çend metreyan dûrî cihê teqînê ye ji me re axivî û wiha got: " Roja teqînê ji ber ku çend kêliyan dereng mabûm, ji mirinê filitîm. Bi dengê teqînê re min xwe gihand cihê bûyerê. Ji bilî avayiyên xirabbûyî, birîndar, şehîd û xwînê min tişteke din nedidît. Parçeyên mirovan li her derê belav bûnûn û xwîn li kolanan tijî bûbû. Mal ji xwediyan re bûbûn goristan. Ew roj rojeke reş bû û ti carî nayê jibîrkirin. Çimkî bandoreke mezin li şêniyên bajêr kir."

**`Hêrsa bûyerê ji welatiyan re bû hêzeke mezin`**

Ehmed bal kişand ser dema bûyerê û wiha dirêjî da axiftina xwe: "Dem û kêliyên wê bûyerê ji bîra me naçin. Lê bi qasî êşa bûyerê hêz û îradeya me xurt û mezintir bû. Tevî ku gelek sivîl di bûyerê de şehîd bûn, lê vîna gelê Qamişlo xurttir bû û hêrsa bûyerê ji welatiyan re bû hêzeke mezin li dijî dijmin û çeteyên hov. Çeteyan xwest bi wê komkujiyê vîna gelê Qamişlo bişkînin, lê negihiştin armanca xwe. Plana komkujiyê ne bi destê çeteyên DAIŞ'ê tenê bû, bi hevkariya hêzên alîgirên van çeteyan ev komkujî pêk hat. Alîgir û serkêşa herî mezin ji çeteyan re dewleta tirkî ya dagîreker e."

**`Kiryar û komkujiyên dagîrkeriya tirkî domandina kiryarên DAIŞ'ê ye`**

Ehmed Mihemed Elî da zanîn ku êrişên niha ji aliyê dewleta dagîrker ve tên kirin domandina vê komkujiyê ne û axiftina xwe wiha domand: "Destpêka şoreşê dewleta tirkî çeteyên DAIŞ'ê bi rêxistin kirin û derbasî herêmên me kirin. Da êriş û hovîtiya xwe li herêmên me pêk bînin û tirsê bixin nava gel. Lê bi saya şervanên YPG û YPJ`ê û lehengên azadiyê, çeteyên hov şkestin. Ji wê demê ve şkestin DAIŞ`ê li xweşê Tirkiyê neçû. Ji bo wê heta niha êrişên xwe yên ser herêmê didomîne û hewl dide ku careke din DAIŞ'ê vejîne. Niha jî bi balafir û topan komkujiyên xwe didomîne. Herî dawî şervanên jin yên Yekîneyên Parastina Jinê (YPJ) kirin amanc." Ehmed Mihemed Elî di dawiya axaftina xwe de bang li gelê herêmê kir ku li hember gef û hewldanên têkbirina destkeftiyên şoreşê û têkbirina îradeya gelê azadîxwaz rawestin û dawî li hovîtiyê bînin.

**`Sibeheke pir bi êş bû`**



Welatiyê bi navê Mihemd Xêr Izet jî şehîdên komkujiya Qamişlo û tevayiya şehîdên azadiyê bîr anîn û wiha got: "Di dema teqînê de ez nêzî cihê wê bûm. Ji nişka ve her tişt li pêşiya çavên min reş bû û ji ber zexta zêde ya teqînê çawa ku kehrebeyê ez girtibim ketim erdê. Nikarim wê rojê ji bîr bikim. Heta sax bim wê ew roj di bîra min de bimîne. Sibeheke pir bi êş bû."

**`Heta nefesa dawiyê emê li ser erdê xwe bin û parastinê bikin.`**

Mihemed Xêr diyar kir ku ti caran kiryarên Tirkiyê û çeteyên wê bandorê li hêz û berxwedana me nakin û axaftina xwe wiha domand: "Rast e çeteyan ev komkujî û gelek komkujiyên din jî li ser gelê me kirin. Lê bi ser neketin û nikarin vîna gelê me yê berxwedêr bişkînin. Çi dibe bila bibe, emê heta nefesa dawî li ser erdê xwe bin û parastinê bikin."
Mihemed Xêr Izet di dawiyê de got, çawa ku me çeteyên DAIŞ`ê şkandin emê hewldanên dagîrkeriya tirk jî têk bibin û wê serkeftin ya ciwan, zarok, jin, kal û pîrên me yên berxwedêr be.

# Perwerdeya Ş. Egîd Cîlo ya dewreya 15`an dest pê kir

**Xalid Etê/Qamişlo**

**Li Akademiya Ş. Egîd Cîlo ya branşên kurdî dewreya 15'an ya branşên wêjeyî bi tevlîbûna 58 mamosteyan dest pê kir.**

Akamdemiya Ş. Egîd Cîlo ya Qamişlo bi tevlîbûna 58 mamosteyan ji Kantona Hesekê û Qamişlo, 27`ê Tîrmehê perwerdeya xwe ya branşên kurdî da destpêkirin. Mamosteyên tevlî bûyîn ji qonaxa navî û amedayî ne. Mamoste herwiha wê di nava 40 rojan de waneyên branşa felsefe, dîrok, sosyolojî, zimanê Kurdî, çand û sincê bibînin .

**`Mamoste di perwerdeyê de fêrî rêbazê wanedayîn û lêkolînê dibin`**

Têkildarî perwerde û naveroka wê ji ji rêvberiya akademiyê Aras Şakir ji me re axivî û got, vê havînê, me perwerdeya grupeke mamosteyên branşên zanistî bi serkeftî qedand û niha me dest bi perwerdeya mamosteyên branşên yêjeyî kir. Perwerdeya akademiyê jî ji aliyê komisyonên biezmûn û pispor tê dayîn. Mamoste bi sîstema projeyên



lêkolînê ya akademiyê ji saet 8`an heta 1`ê waneyên branşê dibînin û piştî saet 3`yan tevlî waneyên perwerdenasînê dibin. Şakir herwisa da zanîn ku aramca wan ya perwerdeyê xurtkirina hêza mamosteyan ji aliyê zanistî, wêjeyî û rêbazên wanedayînê ve ye û axaftina xwe wiha qedand: "Herwisa rêbazên lêkolînê fêr dibin ji bo ku mamosete ne di çarçove û qalibên pirtûkan tenê de xwendekaran perverde bikin. Di encamê de, lêkolîna mamosteyan derbarê waneyekê de dervî çaçoveya pirtûkê, wê mamosteyê pispor derkeve û xwendekar jî wê di asta herî jor de ji waneyê fêr bibe".
Hêjayî gotinê ye ku Akademiay Ş. Egîd Cîlo ya branşên Kurdî 4ê Tîrmeha 2019`yan ji aliyê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Herêma Cizîrê ve li bajarê Qamişlo hat vekirin. Armanca vekirina Akademiyê pêşxistin



û pisporkirina mamosteyan bi branşa wêjeyî û zanistî ye. Herwisa li akademiyê amûr û alavên zanistî û pêwîst hatine bicîkirin. Herwiha pirtûkxaneyeke mezin ku pirtûkên bi çand zimanan lê hene, heye. Heta niha 15 perwerdeya her du branşan hatiye dayîn û jimara mamosteyên tevlî bûyîn 793 ye.



# YPS'ê li hemberî êrişan banga xweparastinê kir

YPS'ê diyar kir ku êrişên nijadperestî yên dewleta tirkî ne li hemberî gelê Kurd tenê, li hemberî tevayiya gelên derveyî Tirkan tên kirin û got, em bang dikin ku li ser esasê xweparastinê her kes li dijî êrişên nijadperestî tê bikoşe.

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

Koordînasyona YPS'ê derbarê êrîşên nijadperest yên li ser gelê Kurd û gelên din yên li Tirkiyê dijîn daxuyaniyeke nivîskî weşand.

**Daxuyanî wiha ye:**

"Ev êrîş ne li dijî Kurdan tenê, di heman demê de li dijî Ermen, Suryan, Asûr, Kildan, Rûm û gelên cuda, Elewî û Êzîdiyan tê kirin û ev polîtîkaya dewleta tirkî ye. Wê ev êriş zêdetir bibin. Dewleta Tirkan di tevayiya sazî û dezgehên xwe li dibistan û medya, siyaset û hunera xwe de bi polîtîkaya yek dewlet, yek dîn û yek ziman 'kesên din' ji xwe re dike hedef. Jixwe bi gotina 'Xwezî bi wî ku dibêje ez Tirk im' di dîroka xwe de diyar kiriye ku wê mafê jiyana azad nede kesên ne Tirk. Kesên ne Tirk dema ku ji ber zextan dibêjin em Tirk in jî wê ev tişt bi kêr neyê. Ji ber ku faşîzma TC'yê di feraseta xwîna saf de ye.

Herî dawî li Sakarya karkerê demsalî yê Kurd Esat Atabay dema heqê keda xwe dixwaze, faşîstê bi anvê Selîm Çabûk êrîşî wî dike. Esat Atabay ji bo gilîkirinê jî dema diçe qereqolê ji bo ku ew û Selîm Çabûk li hev werin jî zext lê tê kirin. Muxtar jê re dibêje 'Vê bûyerê nede çapemeniyê, yan na wê ti kes nehêle li vir bixebitî' û pê re jî êrîşkar berdide. Mirov ji ber vê rewşê ne mumkin e şaş nebe. Selîm Çabûk bi xelata ku stendiye sibê ji bo ku êrîşî Kurdekî din bike, hatiye amadekirin. Di du salên dawî de me gelek mînakên vî tiştî dîtine. Li Merama Konyayê jî di 22'ê Tîrmeha 2021'ê de Hakim Dal ji ber ku Kurd bû hat kuştin. Faşîstekî din jî heft kesên Kurd kuştin. Li Sûltandagiya Afyonê 7 Kurd birîndar bûn. Li Elmadagiya Enqereyê êrîşî malbateke Kurd hat kirin. Li Çorûm, Elmaliya Enqereyê, Akçakocaya Duzceyê, li Bûrsa û Zanîngeha Akdenîzê ya Antalyayê êrîşî malbat û ciwanên Kurd hat kirin. Gelê me ji ber ku bi Kurdî diaxivî, li mûzîka Kurdî guhdarî dikir û ji ber ku dibêje ez Kurd im, êrîşî gelê me tê kirin. Dewleta Tirkan çawa ku li Sêwas, Mereş û Çorûmê




rê li ber êrişkaran xist îro jî bi destê karakterên faşîst Kurdistanê feqîr dikin û li bajarên Tirk sond xwarine ku Kurdan qir bikin.

Stûxwariya li ber faşîzmê wê bibe sedem ku êrîş zêdetir bibin. Divê gelê me li hemberî vê faşîzmê bêdeng nemîne û xwe biparêze. Dema ku mirov ji dewletê hêviya heq, hiqûq û edaletê bike, ev tê wateya xwexapandinê. Em bang li ciwanên Kurd û gelê Kurd dikin ku ji bo ku ev mêtingerî ji holê were rakirin û faşîzm were şikandin, li ser esasê xweparastinê bila li ber xwe bidin."

# `Gotegotên derveyî ragihandina fermî, ne rast in`

**Kemal Akif ragihand ku ti hevdîtinên siyasî di navbera Rêveberiya Xweser, MSD û hikumeta Şamê de çênebûne û got, gotegotên derveyî ragihandina fermî ya Rêveberiya Xweser û MSD`ê, ne rast in.**

Berdevkê Daîreya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê Kemal Akif têkildarî gotegotên derbarê hevdîtinên di navbera Rêveberiya Xweser û hikumeta Şamê de, li ser malpera fermî ya Rêveberiya Xweser bi daxuyaniyeke nivîskî diyar kir ku ti hevdîtinên siyasî di navbera wan û rejima Şamê de çênebûne û di daxuyaniyê de wiha hat diyarkirin:

"Di demên dawî de hin aliyan da xuyakirin ku hevdîtin di navbera Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê, Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) û hikumeta Şamê de çêbûne û hinan ji wan behsa hevdîtin, şert û nuqteyên binakok kir. Hemwextî wê em dibêjin ku li gorî rêgezên diyalogên niştimanî em tev digerin ku lihevkirin û istiqrareke sûrî-sûrî mîsoger bibe.

Di heman demê de em dibêjin ti hevdîtinên siyasî di navbera me û Şamê de çênebûne. Li Kobanê û Minbicê di çarçoveya peymana parastina sînor ya 2019`an de peyman di navbera QSD`ê û artêşa Sûriyê de hene. Gotegotên derveyî çarçoveya fermî ya Rêveberiya Xweser û MSD`ê, derew in."

# Li Bexdayê ji bo jinên Êzîdî konferansek hat lidarxistin

**Navenda Nûçeyan**

Li Bexdayê Konferansa Jinên Iraqê ya Navnetewî ya derbarê Qirkirina Jinên Êzîdî de hat lidarxistin.

Ji bo Fermana Êzîdiyan, jinên Iraqê bi hevkariya Tevgera Jinên Êzîdî (TAJÊ) li Bexdayê konferansek li dar xistin.
Konferansa ku ji aliyê jinên Iraqê ve hat organîzekirin, roja 30'ê Tirmehê li bajarê Bexdayê saet 09:00'an li Otêla Baxda bi dirûşma 'Bi vîna azad ya jinan em li hemberî jenosîda Şingalê tê dikoşin' hat lidarxisitn.

**Di konferansê de rewşa jinên Êzîdî hat nîqaşkirin**

Ji Iraq, cîhan û Rojhilata Navî gelek jinên aktivîst tevlî konferansê bûn.
Tê payîn ku encama






konferansê û biryarên bên girtin bi daxwuyaniyekê werin eşkerekirin.
Hêjayî gotinêye, fermana 3.8.2014'an ya ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê ve hatî kirin, herî zêde jinên Êzîdî bûn qurban û heta roja îro bi hezaran jinên Êzîdî çarenûsa wan ne diyar e. Bin navê gelek sazi û rêxistinên cuda tê idîakirin ku ji bo rizgarkirina jinên Êzîdî kar tê kirin, lê heta niha saziya Tevgera Jinên Êzîdî (TAJÊ) tene karên pir mezin ji bo jinên Êzîdî kirine; bi hezaran jinên Êzîdî rizgar kirine û radestî malbatên wan kirine.

# ’Êrişên dagîrkeriya tirkî li ser gelê Ereb jî xeter in’

## Mihsin Ewedelah diyar kir ku dagîrkeriya tirkî li ser tevayiya welatên Ereban xeter e û got, yekîtiya gelê Kurd û Ereb ji hêzên dagîrker re mirin e.

**Mihemed Xanim / Qamişlo**

Dewleta tirkî ya dagîrker ser 10 salan re ye di karûbarê Sûriyê de destwerdanê dike. Beşeke mezin ji xaka Sûriyê dagîr kiriye û ew herêm ji bo çeteyên weke DAIŞ`ê û El-Nusra kiriye stargeh. Li herêmên dagîrkirî gelek avayiyên mêtîngeriyê ava kirine. Dagîrkeriya tirkî bi alîkariya hêzên Navneteweyî planên xwe yên dagîrkeriyê didomîne. Li ser xetera dewleta tirkî û preojeyên wê yên dagîrkirina Sûriyê, rojnemevanê Misrî Mihsin Ewedelah ku rêveberê rojnamweya El-Şemis News’e ji me re axivî.



### ’Projeyên dagîrkirinê yên dewleta tirkî li ser welatên Ereban pir xeter in’

Mihsin diyar kir ku êrişên dewleta tirkî ya dagîrker li ser tevayiya welatên Ereban xeter in û wiha got: “Êrişên dagîrkeriya tirkî yên ser Iraq û Sûriyê aramiya welatên Erebî dixe xeterê. Kiryarên Tirkiyê li ser yekîtî û ewleyiya welatên Ereban xeter e. Pêwîst e ev welat hewlesta xwe nîşan bidin û bêdeng nemînin. Herwiha divê ragihandina Erebî balê bikişîne ser xapandinên dewleta tirkî yên ser gelê Ereb. Dewleta tirkî xwe wek parêzera Misilmanab û doza Filistînê nîşan dide, lê di dijminatiya welatên Erebî de hevkara Amerîka, Israîl û NATO ye. Çi welatê ku dewleta tirkî destwerdanê lê dike, weke Sûriyê, Libya û Yemenê, li wir çeteyan perwerde dike û wî walatî xirab dike. Dewleta tirkî herwiha dixwaze li Sûriyê jî aramiya herêmê têk bibe û Imparatoriya Osmanî ji nû ve ava bike.”

### ’Hevkariya bi dewleta tirkî re xiyaneta li xak û welat e’

Ewedelah da zanîn ku welatê herî zêde rewşa Sûriyê ber bi aloziyê ve birî Tirkiye ye û wiha dirêjî da axiftina xwe: “Bê destwerdana Tirkiyê, wê aloziya Sûriyê berî çend salan bi dawî bibûya. Vekirina sînorên xwe ji gropên Islamiyên radîkal re û anîna wan ji bo nava xaka Sûriyê, bû sedema berûvajîkirina pêvajoya şoreşa Sûriyê û şer gur kir. Bi riya çeteyên xwe pevçûnên mezhebî derxistin û ev kete xizmeta dagîrkeriya tirkî.”

Ewedelah da xuyakirin ku dewleta tirkî ya dagirker li ser gêlên Sûriyê polîtîkayeke xirab dimeşîne û wiha domand: ‘’Êrişên dagîrkeriya tirkî bûne sedema wêrankirina Sûriyê. Erdogan gelek kiryarên li dijî mirovayiyê kirine û dijî gelê Sûriyê komkujî kirine. Piraniya Sûriyan rastiya planên dewleta tirkî dizanin. **Çi Kurd çi Ereb yên bi dewleta tirkî re hevkariyê bike xiyanetê li xak û welatê xwe dike.** Erdogan wan ji bo xizmeta xwe bi kar tîne. Piştî qedandina armancên xwe wê wan biqewitîne.”

### ’Dewleta tirkî ji bo kûrkirina krîzê li Rojhilata Navî hatiye erkdarkirin’

Ewedelah bal kişand ser desteka Tirkiyê ya komên çete û wiha axivî: “ Ji bo belavkirina krîzê li Rojhilata Navî Tirkiye ji aliyê dewletên Rojavayî ve hatiye erkdarkirin. Eger li herêmên Rojhilata Navî ewleyî û aramî pêk werin, wê ev dewlet nikaribin dewlemendiya Rojhilata Navî kontrol bikin. Libya û Iraq mînakên berbiçav in. Her kes dizane ku dewleta tirkî terorîstan ji bo armancên dagîrkeriyê bi kar tîne û ji bo van planan NATO destekê dide Tirkan.”

### ‘Serçeteyên DAIŞ’ê yên hatîn kuştin tev li herêmên di binê kontrola Tirkiyê de dihatin parastin’

Ewedela diyar kir ku dijminatiya dewleta tirkî ya bi Kurdên azadîxwaz re, ne tiştekî nû ye û wiha axivî: “Bi armaca tinekirina gelê Kurd, Tirkiye rebazên bêexlaq bi kar tîne. Li kîjan aliyê cîhanê Kurdek hebe, wê Erdogan êrişî wî bike. Erdogan beşdarî çi civînê dibe gefan li destkeftiyên Kurdan dixwe. Dibêje Kurd terrorist in. Lê cîhan tev dizane ku Kurd daxwaziya mafên xwe dikin û yên destekê didin terorê dewleta tirkî ye. Tevayiya berpirsên çeteyên DAIŞ’ê li herêmên di binê kontrola Tirkiyê de hatine kuştin û bi sedan jî heta îro dewleta tirkî wan diparêze.”

### ’Projeya Rêveberiya Xweser ya Domokratîk kilîta çareseriya krîza Sûriyê ye’

Rojnemevanê Misrî Mihsin Ewedelah ku rêveberê rojnamweya El-Şemis News’e, ji Reveberiya Xweser xwest bi gelê Ereb re têkiliyên xwe xurt bike û axaftina xwe wiha qedand: “Ji Rêveberiya Xweser tê xwestin ku bi gelê Ereb re têkiliyên xwe xurttir bike. Di navbera gelê Ereb û rêjimên desthilatdaran de cudabûneke mezin heye. Eger Rêveberiya Xweser bikare projeya xwe ji gelê Ereb re zelal bike, wê piştgiriya piştgiriya wê bike. Herwiha pêwîst e bi kesayetên li ser asta cîhanê xwedîbandor re têkiliyan bihêz bike. Divê em projeya Netweya Demokratîk ji bo gelên herêmê bidin nasîn. Ji nivîskar û rewşenbîrên Kurd tê xwestin ku bi rewşenbîrên cîhanê re têkiliyê daynin. Wê yekîtiya gelan nehêla xewn û daxwaziyên Tirkan bigihin encamê.”

# Rejima Tirkî dixwaze navbera Kurd û Azeriyan xirab bike

**Rejima Îran Tirkiyê dixebitin xelkê Rojhilatê Kurdistanê Kurd û Azeriyan berde hve.**

Li gorî agahiyên bi dest ketîn, ji ber rêgiriya avê ya ji aliyê Azeriyan ve ku devera Poldeşt ya 50 km. ji bajarê Makû dûr e ku taybet gundên Sarûx Otîx, Qelaş Lanmîş û Daylan Kind sûdê jê digirin, nerazîbûn hatin nîşandan. Kurd diyar dikin ku zilmeke eşkere li wan tê kirin û vê qebûl nakin. Kurd dibêjin ji ber rêgiriya avê ya li Poldeştê ava li nava dilê gundên me tê, ne em dikarin ji bo çandiniyê û ne jî ji bo heywanan bi kar bînin.

Hin çavkaniyên herêmş wiha dibêjin: “Çavkaniya van nakokiyan dewleta Tirkan û sîxûrên li herêmê ne ku dixwazin aramiya pêkhateyên herêmê tine bikin. Dixwazin Kurd û Azeriyan berdin hev.”



Çavkanî diyar dikin ku li gel gelaciya dewleta Tirkan, daxuyaniyên hinek rayedarên Azerî rewşê aloztir dikin û dixwazin mijarê bixin mijara Kurd û Azeriyan. Li ser vê berî çend rojan li bajarê Poldeşt û çend gundan di navbera Kurd û Azeriyan de şer derket û çend kes birîndar bûn.”
Çavkaniyan piştrast kir ku li ser propagandaya Tirkiyê hin ji Azariyên bajarê Tewrêz û bajarên din ji ber vê mijarê berê xwe dane wan gundan û gotin, li hemberî vê komek ciwanên Kurd ji bo xwe biparêzin amadekarî kirine. Hat diyarkirin ku hinek ji welatiyên van gundan ji aliyê rejima Îranê ve hatine destgîrkirin.

Navê hinek kesên hatîn destgîrkirin wiha ne: “Qudbedîn Elî (45) ji gundê Otîx, Qudbedîn Hisên (45), Omîd Korî Koçerî (33), Tacetîn Emîn (50) û Zahir Mihemed (60).”
***ANF***



## Kurdistan

**Farûk SAKIK**

Di 24’ê Tîrmehê de Kurdan li Lozanê konferansek li dar xist. Nêzikî 57 sazî û rêxistinên Kurdistanî û kesayetên navdar tevlî vê konferansê bûn. Gelek nîqaş, axaftin û nîrxandinên girîng hatin kirin. Her weke provaya salvegera 100’an ya peymana Lozanê bû. Di encamnameyê de plansaziya sala pêş jî hat destnîşankirin.
Emê van daynin aliyekî û behsa mijareke ku bi salan e tê nîqaşkirin bikin. “Li Lozanê Kurdistan hat çar parçekirin”. Na… bi Peymana Lozanê Kurdistan nebû 4 parçe. Jixwe li ser Kurdistanê 2 dewletên dagîrker hebûn. Bi peymana Lozanê jimara dewletên li ser xaka Kurdistanê dagîrker bûn bû çar. Kurdistan ne 4 parçe ye. Dewletên li ser axa Kurdistanê bi cih bûyîn, çar in.
Piştî şaristaniya Medan li ser xaka Kurdan hêz û dewletan dest diguhertin. Yek dihat li ser xaka Kurdan bi navekî cuda împaratoriyek yan jî dewleteke nû ava dikir û roj dihat radestî desthilatdariyeke din dikir. Lê di wan deman de ti carî navê Kurdan û Kurdistan winda nedibûn. Kurdan di her serdemê de nasnameya xwe diparast.
Vê rewşê heta 17’ê Gulana 1639’an dewam kir. Bi peymana Qesra-Şîrîn, ya di navbeyna Osmanî û Safewiyan de hatî imzekirin, Kurdistan bû du parçe. Parçeyê mezin di binê dagîrkeriya Osmaniyan de bû. Vê rewşê heta şerê cîhanê yê yekê dewam kir. Împaratoriya Osmanî di vî şerî de têk çû û statûya gelên di binê dagirkeriya wan de dihat guhertin. Hin gel jî dihatin qirkirin.
Di 24’ê Tîrmeha 1923’yan de, bi Peymana Lozanê, xaka Osmaniyan ku di şerê cîhanê de têk çûbû dihat dabeşkirin. Kemalîstan, Mûsil û Kerkûk firotin Îngilizan da Kurd nebin xwedî statû. Bi vî awayî sînorê xwe yê îro bi dest xistin û Kurdistan jî bû welatekî kolonî ya navdewletî.
Du dewletên nû hatibûn herêmê; Fransa û Ingilistan. Derveyî îradeya neteweya Kurd, nexşeya herêmê jinûve dihate xêzkirin. Başûrê Kurdistanê di binê manda Ingilîzan de radestî rêveberiya Iraqê; rojavayê Kurdistanê di binê manda Fransa de radestî rêvebiriya Sûriyê kirin ku ev xaka Kurdistanê di binê serweriya kolonyalîst ya Osmaniyan de bû.
Dixwazim behsa bûyereke bûyîm şahid bi we re parve bikim. Ji bo girtina vîzeyê min serî li konsolosxaneya Qibrisê da. Şertên ji min hatîn xwestin rêz kiribûn û agahiyeke din jî parve kiribûn û gotibûn; “Em vîzeyê nadin ji bo herêmên me yên di binê dagîrkeriya dewleta tirkî de.”
Bala min kişandibû, çima nedigotin ‘Bakûrê Qibris’. Lewra dijminên wan ew nav lê kiribûn. Bi israr nedixwestin vê têgehê bi kar bînin. Ji bo wan Qibris yek parçe bû. Ti carî negotin welatê me bûye 2 parçe.
Em vegerin Kurdistanê. Herêma di binê dagîrkeriya dewleta tirkî de wiha tê binavkirin; ‘Dogu Anadolu’, vê jî têrê nekir herêmek din jî lê zêde kirin û gotin, ‘Guneydogu Anadolu’. Dijminê gelê Kurd bi zanebûn ev têgeh xistin nava jiyana me ya rojane. Ji bo ku herêm bi Kurdistanê neyê binavkirin. Em jî li gorî wê tev digerin. Ji bo herêma di binê dagîrkeriya Iraqê de jî dibêjin ‘Kuzey Iraq’. Ev têgeh wisa belav bûye û cih girtiye li herêma di binê dagîrkeriya dewleta tirkî de hin Kurdên dijîn, dibêjin “ez çûm, Kuzey Iraqê”. Şerm e.
Divê welatê Kurdan bi Kurdistanê were binavkirin. Mînak; li şûna rojhilatê Kurdistanê, navê herêma di binê dagîrkeriya dewleta Îranê de.
Yan jî navên herêm, bajêr, navçe, gundan were bikaranîn. Li şûna, ez ji bakur im, “ez ji Mûşê me” were bikaranîn.
Dawî: Kurdistan ne çar parçe ye. Çar dewletên dagîrker li ser axa Kurdistanê hene.



# ’Fermana Êzîdiyan ya 2014’an îro jî bi destê dewleta tirkî dubar e dibe’

## Hediya Şemo: Tevî êş û azarên hatîn kişandin, gelê Şingalê bi xwe re hêza jinûavakirina Şingalê dît û li hemberî dagîrkeran serî dananî.

**Mihemed Xanim / Qamişlo**

Êrişên qirkirinê yên li dijî Êzîdiyan di herikîna dîrokê de birêkûpêk hatine kirin. Êrişa destpêkê ya herî berfireh ya tê zanîn, sala 906’an dest pê kir û fermana herî mezin ya dawî jî sala 2014’an bû.

Şeva 2yê Tebaxa 2014’an, çeteyên DAIŞ’ê dest bi êrişa ser Şingalê kirin. Li Sîba Şêx Xidir, Girzerik, Til Benat, Til Qeseb û Koço, bi hezaran mirovên Êzîdî hatin kuştin, bi hezaran dîl hatin girtin û revandin. Yên ji ber çeteyan reviyayîn neçar man berê xwe bidin çiyayê Şingalê. Li ser vê fermanê Endama Rêveberiya Yekîtiya Jinên Êzîdî Hediya Şemo ji me re axivî.

### ’Êrişên dewleta tirkî yên ser Şingalê dewama fermana 2014’an in’

Hediya diyar kir ku armanc ji komkujiyên li ser civaka Êzîdî, qirkirina gelên Kurdistanê ye û wiha axivî: “Dîroka gelê Kurdistanê û tevayiya civakên Rojhilata Navî, di civaka êzidî de ye. Bi bawerî, jiyan, dîrok, çand û hebûna xwe xwediya bîra herî kevnar ya mirovayiyê ye. Ji ber ku xwediya vê taybetmendî û baweriyê bû, ji bo desthilatdaran, bi taybetî dewletên dagîrker her tim weke civaka herî metirsîdar hat dîtin. Ev civak di gelek fermanan re derbas bûye. Fermana dawî Tebaxa 2014,an bi destê çeteyên DAIŞê pêk hat. Dewleta tirkî ya dagîrker bi erişên xwe yên domdar yên ser Şingalê, dixwaze qirkirina çeteyên DAIŞê ya ser civaka Êzîdî temam bike.”

### ’Êzdayî ola yekxwedayî ye’

Hediya Şemo da zanîn ku dîrok bûye şahida gelek fermanan. Lê vî gelî li ber xwe daye û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Fermana yekê ya li dijî gelê Êzîdî pêk hatî bi navê islamê bû ku heta niha jî dewam dike. Dîrok şahida ewqas fermanên li dijî Êzîdiyan bû lê mixabin dîrokê erkê nivîsandina berxwedana vî gelî pêk neanî û nenivîsî ka ev gel çiqas ji êrîşan bibandor bûye û çend hezar bûne gorî. Ola Êzdayî oleke yekxwedayî ye û baweriya xwe bi Xwedê tîne. Lê dewleta tirkî ya dagîrker fermanan li dijî wan dike. Fermana herî mezin ya 2014’an li Şingalê bû ku bi hezaran jinên Êzîdî bûn qurbanên wê. Sedema wê jî ew bû ku civaka Êzîdî sîstema xwe ya xweparastinê û hêzên xwe yên leşkerî ava nekiribûn ku rojeke wekî 3’yê Tebaxa 2014’an xwe biparêzin.”

### ’Kesên 3’yê Tebaxa 2014an civaka Êzîdî bi fermanê re rûbirû hiştîn, niha dixwazin fermanê biencam bikin’

Hediya bal kişand ser rola dagîrkeriya tirkî ya di komkujiya Şingalê de û hewldana Tirkiyê ji bo dewma qirkirina civaka Êzşdî. Herwiha diyar kir ku bêdengiya PDK’ê tê wateya hevkariya wê bi dagîrkeriya tirkî re û wiha got: “ Dema çeteyên DAIŞ’ê Mûsil dagîr kirin, ji navçeyên wê tevan herî zêde xeter li ser Şingalê çêbû. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan berî wê ji bo Şingalê hişyarî dabû. Lêbelê PDK`ê ku Şingal xistibû binê bandora xwe, destûr nedida ti hêzên Kurdî xwe nêzî Şingalê bikin. Di dema destpêkirina êrişa DAIŞ’ê ya ser Şingalê de, nêzî 17 hezarî çekdarên PDK’ê yên li bajêr bê teqandina fişekekê vekişiyan. Wekî tê zanîn dewleta tirkî ji dîroka xwe ve heta niha bi tevayia hêza xwe dijminatiya civaka Êzîdî û baweriyê wê dike. Ji ber wê dagîrkerî êrişî Şingalê dike û pêşengên civaka Êzîdî yên mîna mam Zekî û mam Beşîr kirin amanc “

### ’Civaka Êzîdî ji mirinê nasnameya xwe afirand’



Hediya da zanîn ku tevî êş û azarên hatîn kişandin, gelê Şingalê bi xwe re hêza jinûavakirina Şingalê dît û wiha got: “Bi pêşengiya Meclisa Xweseriya Demokratîk ya Şingalê, hêzên parastinê hatin avakirin. Ji bo civaka Êzîdî ev şoreşek bû. Bi îradeya xwe ya azad xwe bi rêxistin kir û ji bo domandina hebûna xwe li herêmê, li çand û dîroka xwe xwedî derket.”

### ’Xwedîderketina li Şingalê erkê her Kurdê xwedîşeref e’

Endama Rêveberiya Yekîtiya Jinên Êzîdî Hediya Şemo diyar kir ku li dijî fermanan, xweparastin û xwedîderketina li hebûna xwe mafên herî rewa yên civaka Êzîdî ne û axaftina xwe wiha qedand: “Ji civaka zîdî tê xwestin ku yêkîtya xwe xurt bike, têkoşîna xwe bidomîne û destkeftiyên xwe biparêze. Wekî ola Êzdayî dibêje ‘’serê her sera itîfaq e’’. Herwiha li kû dera cîhanê be ji her Êzîdîyî, tê xwestin ku piştgirya Şingalê bike.

# `Li hemberî êrişên dewleta tirkî hevgirtina gelên Iraqê pêwîst e`

**Xalid Etê/Qamişlo**

**Parêzer û çalakvana başûrê Kurdistanê Çîro Şiwanî da zanîn ku dewleta tirkî bi komkujiyên welatiyan sînor tev derbas kirin û got, pêwîst e li hemberî êrişên dagîrkeriya tirkî gelên Iraqê hevgirtî tê bikoşin.**

Dewleta tirkî ya dagîker 20’ê vê mehê li Gundê Geştiyarî Perexê yê Zaxo li dijî walatiyan komkujiyek kir û di encamê de 9 welatiyên Ereb ku di nava wan de 3 zarok jî hebûn şehîd bûn û 33 jî birîndar bûn. Têkildarî êrişa Zaxoy û bertekên li dijî vê êrişê, parêzer û çalakvana başûrê Kurdistanê Çiro Şiwanî ji me re axivî. Şiwanî êriş û kiryarên dewleta tirkî yên hovane şermezar kirin.

### `Dewleta tirkî serweriya Iraqê binpê dike`

Çiro Şewanî teqez kir ku ji ber êrişên Tirkiyê, li her qadê ziyan û kuştin çêdibin û ev nirxandin kir: “Ev ciyê êriş lê hatî kirin, ciyekî geştyarî bû û ev jî ne cara yekê ye ku dewleta tirkî êrişî ciyê sivîlan dike. Berî niha li Kanîmasî ya Silêmaniyê û gelek ciyê din jî êrişî sivîlan kir.”
Parêzera ji başûrê Kurdistanê herwisa ji aliyê qanûna navneteweyî ve êrişên Tirkiyê yên bênavber yên ser başûrê Kurdistanê nirxandin û got, êrişkar bi êrişên xwe, sînor tev derbas kirin. Serweriya Iraqê binpê dike û li dijî pîvan, qanûn û peymana Cinêvê tev digere. Heta di qanûn û pîvanên rewşên şer de jî, mafê Tirkiyê nîne êrişî welatekî din ku ti zirar jê nedîtiye bike. Ji ber wê mafê Iraqê yê gilîkirinê heye.

### `Armanca êrişan jinûve dîzaynkirina Lozanê ye`

Çiro Şiwanî herwisa diyar kir ku dewleta tirkî xwediya proje û planên dagîrkeriya Iraqê ye û axaftina xwe wiha domand: “Her kes dizane ku dewleta tirkî bi êrişên xwe yên Iser Iraq û başûrê Kurdistanê, dixwaze dagîrkeriya xwe ya berî Lozanê vegerîne. Herwiha li ser haman projeyê êrişî rojavayê Kurdistanê jî dike.”

### `Divê Iraq maf û erkê xwe weke dewlet bi kar bîne`

Çîro şiwanî herwiha bal kişand ser erkê dewleta Iraqê û axaftina xwe wiha domand: “Li hemberî van êrişan divê Iraq, mafê xwe wek dewlet bi kar bîne û zorê bide Tirkiyê ku êrişên xwe rawestîne. Vê jî dikare bi riya dadgeh û qanûna navnetewyî bike. Iraq herwiha dikare bi riya aborî bersiva Tirkiyê bide û madeyên Tirkiyê li bazarên xwe qedexe bike. Ji ber wê derfetên ku Iraq pê bersiva Tirkiyê bide



di qada leşkerî, siyasî û aborî de hene. Bi siyaseteke wisa wê derbeke mezin li Tirkiyê bixe.”

### `Li hemberî êrişan pêwîst e gelên Iraqê hevgirtî bin`

Çalakvan û parêzera ji başûrê Kurdistanê Çîro Şiwanî da diyarkirin ku gelê Iraqê eger bi yekîtiya xwe nebin xwedîhelwest metirsiya dagîrkirina welat heye û axaftina xwe wiha qedand: “Banga min ji bo gelên Iraqê heye ku yek bin bin û li hemberî êrişên dewleta tirkî hevgertî bin. Lewra ji her demê pirtir pêwîstî bi hevgirtinê heye.”

FENER



## Ha li Iraqê daye, ha li Sûriyê ferq nake!

**Idrîs HENAN**

Li gorî ajansa istixbarata Rûsî, Erdogan, Barzanî şandiye Bexdayê ku hinek helwestan nerm bike û amade ye ku tawîzan bide. Lê tenê bila Iraq meselê mezin neke.
Çaxa Barzanî li Bexdayê ketibû bextê El-Kazimî û hinek rayedarên din yên Îraqê ku “zimanê dîplomasiyê hilbijêrin” û li dijî kiryarên Tirkiyê “bêhelwest bin” li NewYorkê, Kosneya Ewlekariyê ew sûcê Tirkiyê li Zaxo kirî, şermezar dikir û dawa rêzgirtina ji serxwebûna axa Iraqê re dikir. Di heman demê de piştgiriya lêpirsîna derheqê êrişa Tirko de dikir û bang li welatên endam kir ku desteka pêwîst bidin lêpirsînê.
Di aliyê fermî de, piştî ku Barzanî dibe Serokê Hikûmeta Herêma başurê Kurdistanê, ji sê salan vir ve, cara duduyan e ku serdana Bexdayê dike. Çavkaniyên siyasî diyar kirin ku armanca serdana “jinişkave” ya Mesrûrê Barzanî, nîqaşkirina komkujiya dewleta faşîst ya tirkî li Zaxo kirî û nermkirina helwestên tund yên li dijî Tirkiyê ye. Li gorî heman çavkaniyên siyasî, çavdêr û şopînerên rewşê; Barzanî li gorî fermana Tirkiyê tevgeriyaye û li ser daxwaziya wê çûye Bexdayê da rola navcîtiyê bike.
Jêderên din yên nêzî navendên biryarê dan zanîn ku; Tirkiyê nameyek bi rêya Barzanî rêkirye Bexdayê û tê de xwestiye Iraq biryarên giran derheqê Tirkiyê de nede û li dijî wê ti bertekên skendal nîşan nede. Ew jî amede ye tawîzan bide malbatên qurbanên komkujiya Zaxo!
Di nav bertekên li Iraqê derketîn de, girtina dergehê “diziyê” yê Îbrahîm Xelîl dihat nîqaşkirin. Ji ber wê yek ji erkên Barzanî ew bû ku; Bexdayê bide iqnakirin ku wê biryarê negire û dergeh vekirî bihêle.
Tevî ku helwesta Iraqê ya fermî şîlo û ne li gorî kapasîteya bûyerê bû, lê di çarçoveya destdirêjî û destwerdanên dagîrkeriya Tirkiyê ser axa Iraqê cara yekê ye biryareke wisa li NY tê girtin. Hêrsa gelên Iraqê jî lê zêde bike, diyar e wê rewşa dagîrkeriya tirkî li herêmê bi vî rengî bê hesab û kitab nemîne.
Wextekê de rayedarên Iraqî Tirkiye sûcdar dikirin ku komkujî kiriye, Tirkiyê red dikir û serokê wê Erdogan derew dikirin û digot; armanca êrişa ku “terorîstan” kiriye, xirakirina têkîliyên her du welatan e. Erdogan li ser ekranan dereweke mezin kir û şîret li Iraqê kir ku nekeve qaşo, xefka propagandaya “çekdarên Kurd”. Bawer nakim rezaleteke ji vê mezintir hebe. Sîstema dewlet-neteweyê, bêrêzî û bêexlaqiyeke herî mezin e.
Aliyekî Qibrisa Yûnanê nîvsedsalek e dagîr kiriye û gefan li Yûnanê dixwe ku wê giravên li deryaya Îce yên di binê serweriya wê de dagîr bike. Piştî ku derveyî parvekirina tora gaza Deryaya Spî ma, berê xwe da tawîzan û li mutefiqên xwe vegeriya. Ji ber deriyê Mîrnişînên Erebî, Îsraîl, Erebiya Siûdî, Misir û Îranê, ji ser çongan ranebûye. Ji ber wê li Misirê dike ku “çima xwe giran dike” Vê dawiyê jî li deriyê rejima Sûriyê da ku amade ye her tiştî deyne aliyekî û piştgiriya wê ya siyasî bike û alîkariyê bide ku sîstema Rêveberiya Xweser tine bikin û li dijî Hêzên Sûriyeya Demokratîk şer bikin.
Ango, amede ye, ew û çeteyên xwe, bibin leşkerên rejima Şamê û çendî xwîna vî gelî rijandine û derbider kirine, ne xema wan e, tenê tişta serê wan diêşîne, pirsgirêka Kurdan e.
Ji ber vê jî ha li Iraqê daye, ha li Sûriyê, bi xoşxoşkan yan li ser çongan be, ferq nake, ya girîng têkbirina Kurdan û jidestbirina isiyatîfa gelan ya bi pêşengiya teoriya Neteweya Demokratîk ya hevjiyana azad û konfederalîzma demokratîk e.